Bapîrê Min Huseyîn

-Menaf Osman-

Ez dikarim bi hêsanî bibêjim ku çavkaniya şahî û hêviyê di tevahiya jiyana min de zarokatiya min bû. Û yek ji lehengên zarokatiya min ku ez ê qet ji bîr nekim bapîrê min Huseyîn e.

Bapîrê min, Xwedê rehma xwe lê bike, xwediyê yekane baxçeyê fêkiyan li gundê me bû, ku tê de darên fêkiyan ên cûrbecûr hebûn. Di nav darên baxçeyê bapîrê min de darên behîvan hebûn ku ji çar aliyan ve dorpêç dikirin. Lêbelê, bapîrê min destûr nedida ku kes fêkiyên van daran bixwe, her çiqasî ku ew fêkî bêyî ku bêne çinîn hişk bibin jî. Tenê di nava du mehan de, ew behîvên kesk ên xweş hemî veguherîn dendikên hişk û qaşilên darîn, bêyî ku kes jê sûd werbigire. Lê em zarok, em darînîbûn bêdeng bimînin li ser vê bêwateyê!

Bêdengmayîna di rewşên weha de, tenê taybetmendiyeke mezinan e! Ji bo me yên piçûktir, me red kir ku em bêdeng bimînin. Me red dikir ku em li gorî fermanên wisa bêwate yên bapîrê xwe tevbigerin.

Di şevên biharê yên pir xweş de, em bir bi bir li hev dicivîyan, û me ji mezintirînê xwe ferman digirtin, ku bi gelemperî ew di derbarê operasyonên nepenî de zanayên me bûn. Piştî wergirtina fermanên pêwîst, em bi kelecanî li benda şeva tarî diman, ku baskên xwe bavêje ser gundê me yê aram û şert û mercên pêwîst ji bo “operasyona” me biafirîne. Piştre me êrîşî ser darên behîvterkan dikir, ji bo ku em têra xwe bixwin, bêrîkên xwe jî dabigirin û bi serfirazî vegerin mabin xwe!

Lêbelê, em nekarîbûn di demjimêrên wisa dereng de, bi ewlehî vegeriyana malên xwe. Em bi dizî diketin hundur de û bi nepeniyeke mezin jî diketin nav nivînan de, bêyî ku em bala dê û bavên xwe bikişînin ser xwe û em xwe wisa nîşan bidin ku em ji zû ve di xew de ne. Di demên weha de, bapîrê min bi gelemperî li oda xwe ya mêvanan êvarokeke zindî li dar dixist, ku her kesî ji dil û can serpêhatiyên wî guhdar dikirin. Ew serpêhatiyên wî yên lêxistina sînorên mayînkirî yên di navbera me û Tirkiyeyê de. Ev êvarên bapîrê min mîna mertalin xwezayî bûn ji bo “operasyonên”, ku bi heyecana xwe ji yên wî ne kêmtir bûn. Ger çalakiyên me bihatana kifşkirin û nûçe bigihîşta bapîrê min, çarenûsa me ji bextewariyê dûr diket. Em rastî cezayên cûr bi cûr dihatin. Bapîrê min, dê û bavên me tawanbar dikirin ku terbiyeden baş nedane me û em baş mezin nekirine.

Li gundê me yê ku bi nirxên xwe yên exlaqî yên bihêz dihat nasîn, dizî wekî sûcê herî xirab dihate hesibandin. Digel vê yekê, em fêr bûbûn ku wan heqaret û cezayan gişan tehemûl bikin da ku em plana di hişê xwe yê ciwan de kok daye, pêk bînin.

Carekê, di navbera me û bapîrê min de li ser dizîya behîvan şopandineke germ derket. Kesekî plana me ji bapîrê min re ragihandibû û jê re gotibû ku di nava daran de dizên amator hene, bexçeyê te talan dikin. Ji ber vê yekê, bapîrê min, ê ku ji min pir hez dikir, hêrs bû û ji nişkê ve bi darên xwe re eleqedar bû... Ez nizanim çima. Her çiqasî ku ez pir li ser fikirîm jî, lê ez têneghiltim bê armanca wî ji wê yekê çi bû. Lewre ne wî sûd ji darên xwe werdigirt û ne jî destûr dida kesekî din ku sûdê ji wan bigire. Tiştê ku bapîrê min dikir ew bû ku li wan xwedî derdiket, av dida wan, giyayên li dora wan radikir û ew ji me zarokan diparast û hew.

Vêca dema ku ew ji plana me ya dawî agahdar bû, bapîrê min plana xwe guhert. Wî alîkarî ji sê xayînên di nav me de xwest da ku ji me re xefikekê deyne, me di ser sûc de bigire.

Îcar ew hevkarên me jî, plana me bi temamî dizanibûn; dizanibûn em ê li ku, çawa û çi bikin. Bapîrê min soz dabû wan ku eger ew me di ser sûc de bidin malbatêndê xelatên giranbiha bide wan. Wan dê xelat ji kalkê min bigirtana, emên kemê bi cezayê mezin re rû bi rkabimana!

Wekî her car, tîma hevkarên me ji Xeyro, Cemo û Maho pêk dihat. Ji bo me şans bû, vê carê plana wan bi ser neket, berevajî hewldanên berê. Ew jî bi saya Şîrînê bû. Xwişka Xeyro ya delal û dilovan ku pir nêzîkî min bû. Û kêfxweşiya me çiqas mezin bû dema ku ev kemîn bi ser neket.

Di êvara operasyonê de, tenê çend demjimêran beriya ku em herin, Şîrînê, keçika bisinc ku bi me re di pola pêncan de bû, hat ba me û ji me re got ku Bapîrê min ji plana me agahdar bûye û kemînek dijber li himberî me amade kiriye. Ji ber vê yekê em neçar ma ku plana xwe zû biguherînin û wê şevê dev ji xwarina behîvan berdin. Û bi rastî, me wisa kir û em ji kemîna dijber xilas bûn.

Lêbelê, her kesê ku ji baxçeyê bapîrê min bihîv tam bikira, nikaribîbû bi tevahî dev jê berde. Û şeveke havînê ya xweş, me dîsa dizîya bihîvan hilda rojeva xwe. Wê şevê wext dereng ketibû, û dema ku ez hildikişiyam ser darekê, min dît ku çivîkek li kêleka min razaye! Xwedêyo! Nikaribû bifire jî mîna ku qidûmên wê şikestibin! Min destê xwe dirêj kirê û ew bi hêsanî girt. Û gava ku min hinekî din li dora xwe nihêrî, min fêm kir ku gelek ji wan çivîkên serxweş li dora min hene! Xwedêyo, ewqas pir bûn! Ji nişkê ve, ramanek hat bîra min: Çima bihîv û çima ne ev çûk!?

Min gazî Alîko kir da ku ew jî mêçîra çûkan bike û dev ji bihîvan berde. Piştre min heman tişt ji Amer re jî got, û me dest bi nêçîrê kir. Girtina çûkan bi şev çiqasî hêsan bû! Bi roj, me bi sedan dafik datanîn û em bi seatan li pey wan dibeziyan heta ku me yek dadini wan

digirtin. Lê girtina du çûkan bi şev, ji du deqeyan ne zêdetir bû. Em çiqasî bêaqil bûn! Çima em berê li ser vê yekê nefikirîbûn?

Lê paşê em rastî pirsgirêkekê hatin: kêrên me tunebûn ku em wan serjê bikin.

Tûrikek, kîsik an jî tiştekî ku wan bixênê jî bi me re tunebû. Ji ber vê yekê me biriyar da ku em serê çûkan jê bikin û bavêjin bin darê. Lê Emer li dijî vê yekê derket û îdia kir ku ev yek heram e. Emerê me her tim wisa dilovan û xwedaparêz bû, mîna diya xwe! Lê min ew şermezar kir û piştrast kir ku min bi xwe bihîstiye û dîtiye ku Mela Beşîr fetwa vê yekê daye, dema ku nêçîrvanê me Ebdu jê pirsîbû bê gelo destûr tê dayîn ku serê çûkan di dema nêçîrê de were jêkirin. Mela jî bi erênî bersiv dabûyê. Jixwe em jî nênêçîrvan bûn û ew fetwa ji bo me jî derbasdar bû.

Li gundê me fetwa wisa dihatin dayîn û di cîhana me zarokan de jî wisa dihatin dayîn! Û bi vî awayî, me di çend deqeyan de nêzîkî 30 çûkî, an jî dibe ku bêtir, girtin. Em bê rehm bûn, me bi destên xwe yên tazî serê wan jê dikir û tavêt binê darê. Bi rastî jî nêçîreke bilez û hêja bû!

Her çiqasî ku ezmûnek nû bû jî, ji dizîna behîvan pir çêtir bû. Di dawiyê de, me nêçîra xwe li hev par kir, her yekî ji me bi kêfxweşiyeke mezin para xwe girt!

Lêbelê, dema ku ez vegeriyam malê,yem hemû matmayî man! Hesabên me xelet bûn û me qet nizanîbû ka wê çi bibe. Lewre malbatên me gişan pir hêrs bibûn jî ber wan kiriyarên me.

Her yek ji me ji ber wê kiryara me ya hovane, ya serjêkirina wan çûkên bêguneh, rastî cezayên giran û heqaretên bêhejmar hat ji dê û bavên xwe! Ya xerabtir jî, dayikên me, hemû çûkên ku me nêçîr kiribûn avêtin ber kûçikan û nehiştin ku em wan bixwin, bi îdiaya ku ew li gorî qanûna îslamî nehatine serjêkirin. Çi projeyek têkçûyî bû, û çiqase êş dida mirov! Bi taybetî jî gava min temaşe dikir û diya min goştê çûkên min diavêt ber kûçikan! Ew goştê xweş ê ku min tamek jê nekiribû, û min nizanîbû bê çima di ola me de qedexe ye! Di wê gavê de, min dixwest ku ez Êzîdî an Zerdeştî bûma!

Erê, heke ez Êzîdî bûma, min ê ew goşt hemû bixwara. Êzîdîyan destûra xwarina goştê wisa didan. Jixwe di hin rewşan de, wan û ajalên xwe ji heman tasê vedixwarin.

Dema ku em ji bo sersaxiyê diçûn gundê cîranê wan Xirbet Cemal, diya min carekê ji wan pirsî ka çima ev yek çêdibe û ew çawa dikarin ji heman cihê ku kûçik û heywanên wan avê vedixwin vexwin. Jineke êzîdî bi hêsanî bersiva diya min da û got: “Kirîva min a delal, zimanên me gişan sor e, û di navbera me û heywanên me de ti ferq tuneye. Zimanên me sor in, her weha kûçik, pez û ker jî. Ji ber vê yekê çi xelet e ku em ji heman cidî avê vexwin? Xwedê em wisa wek hev afirandine!"

Di wê gavê de, rûyê diya min ji vê ravekirinê tarî bû, lê wê bersiv neda. Lêbelê, wê çaxê jî meyla min bi ser raya wê jinê de bû. Di her rewşê de, êdî ti wateya nîqaşkirina van mijaran tune bû, ji ber ku hemî goştê çûkan di zikê kûçikan de bû êdî!

Bila Xwedê rehma xwe li te bike, Bapîro! Ax… ax, çiqase bîranînên ecêb ên min û te hene! Lê çima ev hemû tevlihevî? Çima ez evqasî xema rabirdûyê dixwim, û çima ev qase bîranînên biêş?

Çima ev hemû hewildan? Çima ez hewl didim ku rabirdûyê bi vî rengî bi bîr bînim?

Îro ji bo min tiştek ji nûçeya vegera bavê min a ji bajêr girîngtir nîne. Ez bi bendewariyeke wisa mezin li benda wî me, ku ez pê dişewitim! Ez bi baldarî guh didim her dengekî ku ji derve tê. An jî, her dengekî ku ji kûçika me Warda dertê ku qet dev ji ewtandina xwe bernade.

Kesek nikarîbû biketa gundê me de, bêyî ku em pê nehesin. Lewre Ketina her kesî, her gav bi ewteewta Warda re dest pê dikir. Werda ji bo hemî gundiyên me mîna zengilekî alarmê bû.

Bavê min vê carê dereng ketibû! Îro Pêncşem e û sibê jî În, roja Cejnê ye. Bavê min jî hîna venegeriyaye! Ez ê bikaribim çi ji zarokên gund re bibêjim ger bavê min neyê û şalwar û pêlavên nû ji min re neyne? Lê wî soz daye min ku ew ê bikire! Erê, wî soz da ku şalwar û pêlavên min bîne! Wî soz da û sond jî xwar! Bavê min nikare soza xwe bişkîne; ev yekane taybetmendiya wî ya baş e ji bo min. Lê mixabin, dema ku wî behsa pêlavan kir, sond nexwar! Dîsa jî ya herî girîng ew e ku ewê îro bê, heger neyê wê rewş pir xerab be.

Di herdu rojên borî de, ji bilî min her kes li ser cilên xwe yên nû û diyariyên ku bavên wan ji wan re anîbûn diaxivîn. Her kesî – tev li Xeyro - bi şalwar û pêpêlavê çermînî xwe nîşan dida, çantê xwe yê dibistanê, qutiyên qeleman û qelemên rengîn ên ku bavê wî jê re kirîbûn pesnê xwe dida.

Min dizanîbû ku her kes dixwaze bi vê yekê min provoke bike. Lê min guhê xwe kerr kiribû, ango ez bêdeng mabûm û min her tiştê  xwe di hundurê xwe de girtibû, bi hêviya ku bavê min êvarê vegere. Hemû êşa ku ez niha dikişînim ji ber bavê min e! Bavocan, ka çima tu nayê? Çima tu dihêlî ku kurekî mîna Xeyro min biçûk bixe û heqaretê li min bike! Ew Xêroyê ku hîn jî di pola çaremîn de ye û nizane komkirin, jêbirin û dabeşkirina bingehîn! Lanet li vê serdema ku dihêle kesekî mîna Xeyro heqaretê li yekî mîna min bike! Xeyroyê ku her roj ji ber bêbextbeên xwe, ji ber destên xwe yên qirêj, ji ber bêhna xwe ya genî rastî ceza dihat.

Bila wisa be... Niha tu dikarî henekê xwe bi min bikî, Xeyro yê çentexweşik. Lê di demek nêzîk de em ê herin dibistanê û emê bibînin bbê ka tu çiqas jîr î, dema ku mamoste pirsa spartekan ji te bike! ! Tenê çend rojên din... paşê tu ê werî cem min û lalan  ji min bikî ji bo ku ez alîkariya te bikim di dersên te de! Bêyî alîkariya min tuyê çawa pirsgirêk û nivîsên xwe yên matematîkê çareser bikî? Te ji bîr kiriye ku tu nikarî bi erebî du peyvan jî rast binivîsînî! Erê, tu dê hewceyê min bibî, Xeyro... tu yê hewceyê min bibî, û tu yê werî ba min. Tu dê serê xwe li ber min xwar bikî û tikan ji min bikî. Wê gavê ez dizanim ezê çawa bi te re mijûl bibim. Lê... lê pêşî, divê îro bavê min were! Bê guman divê ew were û ji min re şalwarên xweşiktir ji yên Xêro bîne!

Lê mixabin, tenê şalwar jî têrê nake; lewre ez baş dizanim ku hemî hevalên min ên polê dê pêlavên çermî yên geş li xwe bikin. Ax bavo Ax! Bavo soz neda ku pêlavekê jî bikire; wî tenê got ku heke pereyên wî bimînim, ew ê solekê ji min re bikire...

Pêlav. Ev hinceta wî ya asayî ye, ya ku wî bi hemî birayên min re bikar dianî. Çi gava ku wî dixwest wan tiştan dereng bixe wisa digot. Icar ku sibe di Cejnê de wisa bi serê min jî bike, ez ê çi bikim! Heke bavo tenê şalwar ji min re bîne ez ê çi bikim? Ma bi rastî jî ez ê neçar bim ku şalwarê nû ligel wan pêlavên plastîk li xwe bikim! Ax Ax! Baştir e ku bavo îro neyê! Bi kêmanî ewê hincetek hebe ku ez xwe nîşanî hevalên xwe yên polê nedim. Erê, ewê çêtir be! Ez ê bi tenê ji wan re bibêjim: Bavê min ji ber sedemên girîng û lezgîn ji bajêr nehat, nexwe ew ê ji min re şalwarekî spehî û pêlavên çermînî yên reş bianiya.

Lê... lê di vê hemûyê de çi sûcê min heye?! Lanet be! Ez nizanim ez ê çawa ji vê rewşê derkevim. Dibe ku eger bavê min mîna bavê Xeyro dewlemend bûya, her tişt niha pir cuda bûna! Lê bavê min çawa dikarîbû dewlemend bibûya û tu huner pê re tunebûn ji xeynî çîrok û gotegotên bêkêr? Bavê min tenê çend rojan di salê de dixebitî. Tenê çend donim erd diçandin û tiştê mayîn ji salê bi titûn û dûmana çixareyan re derbas dikir. Dema xwe giş dida sohbet û çîrokên bêdawî yên ku ji gundiyan re digot, di odeya me ya mezin de, ji bo ku şevên zivistanê yên dirêj derbas bikin.

Ji nişkê ve bavê Şêxo hat bîra min ku du sal berê çiqasî feqîr û belengaz bû. Lê wî koçî bajêr kir, çû li wir şuxulî û dest bi anîna pere, cil, pêlav û biskuwîtan kir.

Şêxo, kurê bavê xwe yê herî biçûk bû, di pola duyemîn de bû û ji niha ve bi pênûsa hibrê dinîvisand û sê pêlîstokên wî hebûn. Ê min jî, ez di pola çaremîn de bûm lê hîn min bi pênûsa risas dinîvisand. Ew jî yek tenê bû ku dema xilas dibûya, diviyabû ez yekê deyn bikim ji hevalên xwe yên polê, hetanî ku bavê min yeke din ji min re bikiriya. Ax, xwezî qelemek min a hibrê hebûya! Lê xuya ye ku bavê min wî tiştê ku bavê Şêxo kiriye bike. Bavo dibêje ez nikarim karê dijwar bikim. Ji hêla din ve, diya min her tim jê re dibêje biçe bajêr û li wir bixebite, da ku tu bêtir qezenc bike û pereyan bîne. Lê bavê min red dike, û pir caran nîqaşên devkî bi hev re dikin ku bi saetan didomînin. Carinan ew nîqaşên wan digihîjin şîdeta fîzîkî jî!

Lanet li tundûtûjiyê be! Lanet li nîqaşan be... Xwezî em li bajêr bûna... BAJAR!

Ew pir caran li ser bajêr û hemî tiştên wî dipirsim. Xelk jî diaxivin, dibêjin ku gelek mirov û gelek zarok lê hene. Sûk û bazar û dikanên her tiştî hene. Heta hinek dikan hene ku ji bilî pêlavan tiştekî nafiroşin, tenê pêlavan difiroşin.. Ax, ka pêlavên min li ku ne!

Carekê min dikanên bajêr ji diya xwe pirsî, wê got, "Kurê min, dikanên bajêr hinekî dişibin dikana Xaltîka Badriya, lê mezintir û firehtir in, û tiştên wan bêtir in."

Xaltîka Badriya jineke bî bû, bûgo bi têgeheke rasttir, jineke ku mêrê wê ew terikandibû. Pir feqîr û çikûz bû. Wê pelên çaya çêkirî li ber tavê radixistin da ku hişk bibin, dûv re jî dîsa bi bikar dianî. Ew mînaka çikûzîyê bû di gundê me yê bêdeng de.

Ez hîn jî li ser bajêr difikirîm dema ku min dengê kûçika me, Warda, bihîst ku wê em agahdar dikirin bi hatina mirovên nû. Ez bi lez derketim derve û bi hewes min derdora gund qoleçan kir. Min dît ku motorsîkleta me ya sor ji bajêr tê. Motorê ku birayê min Alaa bikar dianî, û bavê min jî li pişt wî bû. Çenteyên ku bi rojan em li bendê bûn jî di destên wî de bû! Ax, kêf kêfa min bû êdî! Ji nişkê ve tevahiya malê pir zindî bû.

Dema ku bavê min dixwest bikeve hundirê malê, min destên wî gir, maç kir û jê pirsî bê gelo wî şalwar û pêlav ji min re aniye an na. Gava ku deng ji bavo nehat min dûbare kir: "Te ew ji min re anîne, Bavocan? Ji kerema xwe ji mdûbarebibêje!"

Pirs li ser lêvên min dubare dibû û ez bi bêsebrî li benda bersiva wî bûm, lê bavê min bala xwe jî neda min. Heta li aliyê min jî nedinêrî!

Ez nikarim vebêjim bê wê gavê min çi di dilê xwe de hîs dikir!

Hişê min bi tevliheviyek ramanan diherikî. Min hewl dida ez bisêwirînim bê ka sibe ezê çawa derkevim raberî Xeyro û Şêxo bi van pêlavên xwe yên kevin û ew bi wan şalwar û pêlavên xwe yên nû! Ezê çawa bikaribim bi vî rengî li rûyê wan binêrim? Ax Şêxo, ax! Tu dixwazî tinazên xwe bi min bikî û tu yî bêkêrê pola me! Baş e, Şêxo, sibê ez ê nîşanî te bidim ka meriv çawa tinazên xwe bi xwendekarên jîr dike ji ber kinc û solên wan!

Ez ê nîşanî te bidim... Ez ê hestiyên te bişkînim, ezê cilên te yên nû biçirînim û tif bikim ser çavên te û pêlavên te! Sibê tu yê her tiştî bibînî... Lanet li te be pîsê heram!"

Ev hemû di hişê min ê ciwan de digeriya û ez bi pêlên hestan, mîna deryaya har, di nav nifiran de mam! Bavê min qet ne xema wî bû û hayê wî jî ji min tunebû! Ew bi bersivdayîna pirsên mezinan ve mijûlkar bû ku xelkê di derbarê tiştên herî piçtiştêden ku li bajêr qewimî bû dipirsiyan. Ew kêlî, kêliyên herî dijwar bûn ji bo min.

Piştre ez bi lez û bez çûm cem diya xwe, ku çûbû odeya din da ku li çenteyan binêre û bibîne ka bavê min ji bajêr çi aniye. Meraqa min a dijwar ez ber bi wê yekê ve birim ku berî ku diya min çente veke, min ew hejand, da ku bibînim ka di hundirê wî de çi heye. Diya min çente vekirin... Gelek tişt tê de hebûn: Kincên ji bo diya min, yekî din jî ji bo xwişka min a yekane, Zozanê... kirasek ji bo Nasrî û jaketek ji bo Seîf... û dû re jî pantolonê min! Xwedêyo çiqasî xweşik bû!

Bila tu biçî dojehê, ey kalê hesûd! Bi rastî jî pir xweşik bû, lê pêlav li ku ne, dayê? Diya min qet guh neda pirsa min. Û gava min bi serhişkî dubare kir, wê bi guman li pirsa min a li ser pêlavan bersiv da!

"Kurê min, pêlav ji bo çi lazim in? Jixwe pêlavên te hene û vaye şalwarê te yê nû hatiye de êdî tu doza çi dikî! Ew ji bo cejnê bes in. Ji bîr meke ku em xizan in, kurê min!

Xizaniya lanetkirî! Ger hûn xizan bin, çi eleqeya min bi xizaniyê re heye? Ez tenê ptenêan dixwazim! Tenê pêlav, dayê! Lê min qet bersivek negirt! Tew gava ku bajar ewqasî dûr be û cejn jî sibe be, çi feydeya bersivê heye, ji niha û pê de!

Kêfxweşiya min a ji bo bidestxistina wî şalwarî tenê çend saniyeyan dom kir. Xemgîniya min çiqasî dijwar bû! Ax, kêliyên kêfxweşiyê di jiyana min de çiqasî kurt û demkî ne! Û kêliyên xemgîniyê çiqasî dirêj in!

Kêliyên xemgîniyê!

Hêsirên min bêdeng û germ diherikîn di ser hinarkên min re, dema ku min xwe da quncikekî malê û axîneke kûr kişand. Lê dîsa jî, kesî di malê de li min nedipirsî! Her kes bi xwe ve daketibû bû... bavê min, diya min, xwişk û birayên min... kesî li min nedipirsî. Wisa xuyadikir ku her kes hînî adetên min bûbû û ji xwe re digotin: "Jixwe ev hîna zarokek e, û normal e ku zarok bigirîn û xemgîn bibin. Ew ê di demeke kurt de haş bibe, paşê ew ê hişê xwe bîne serê xwe."

Jixwe hemû, her gav wisa difikirin di derbarê min de. Lewre ez rojê carekê bi wan re şer dikim û roja din jî ez xweberî haş dibim. Doh, min bi wan re li ser defteran şer kir, û du roj berê, min li ser refika pirtûkan bi wan re şer kir, ku min hîna jî ew negirtiye. Her çendîn ku bavê min ji min re got ku heke ez pola sêyemîn derbas bikim, ew ê ji min re refikek pirtûkan a xweşik bikire.

Lê wî soza xwe negirt, lewre niha ez di pola çaran de me. Niha jî ew ji min re dibêje ku eger ez pola çaran biqedînim, ew ê ji min re çenteyekî dibistanê bikire. Dibe ku sibê ew dîsa li soza xwe xwedî dernekeve dema ku ez pola pêncan biqedînim... Ez êdî qet baweriya xwe pê naynim. Her sal ew soz dide ku heke ez di pola xwe de rêza yekem bigirim, ew ê ji min re tiştan bikire, lê ew qet li sozên xwe xwedî dernakeve. Di vê navberê de, ê min hîna min yek minê xwe jî neşikandiye . Lê ew her gav sozên xwe ji salekê ber bi saleke din ve paş de dixîne û ez jî mîna tayê ku derziyê bişopîne li dû wan sozên xapînok diçim!

Ne tenê bavê min; Ez êdî baweriya xwe bi tu kesî di malê de naynim, û min hemû bala xwe daye xwendinê. Lewre tenê ew şans di destê min de maye. Heger ez zanîna xwe baştir bikim û xwe ji her kesî re îspat bikim. Lewre tenê çend roj berê, mamosteyê dibistanê hat mala me, û hîna di bîra min de ye bê çawa bi bavê min re axivî li ser jêhatîbûna min a di dibistanê de. Û çawa li ber tevahiya gundiyan pesnê min da!

Mamoste destê xwe bi şanazî di ser serê min re birûanî û ji bavê min xwest ku baş li min xwedî derkeve. Di pey re jî lê zêde kir û digot, "Ev kurê te pir zîrek e, baş li wî xwedî derkeve, ji ber ku ez pêşerojek geş ji bo wî pêşbînî dikim..." Min bi tevahî fêm nedikir bê mamoste çi dibêje, ez bi gotinên wî kêfxweş dibûm û min serê xwe li ber hemû xwendekar û nasên xwe bilind dikir. Ez dikarim bibêjim ku tenê tiştê ku min bi vî rengî dilsozî xwendina xwe domand helwesta wî mamosteyî bû ku min heta îro min ew ji bîr nekiriye û ez qet wî ji bîr nakim!

Şev dereng ketibû û êdî Cejn ne dûr bû!

Bi rojhilatinê re wê her kesî dest bi amadekariyên cejnê bikirana. Di nava çend seatan de jî wê her kes ji bo Cejnê amade bibûya...Di seransera salê de em tev de li bendî vê rojê bûn, da ku em hemû cûdahî û pirsgirêkên xwe li aliyekî bihêlin û hemû bi hev re şabibin.

Her kes bi kêfxweşiyek bêtimtêl li benda Cejnê bû. Roja Cejnê di nava jiyana me ya li gund a dijwar de, mîna kulîlkeke di nava stiriyan de bû. Ev tenê roja bextewariyê bû ji me gundiyan. Ew tenê roja bextewariyê bû ji bo her kesî. Lê yê min, ne ez baş bûm, û ne jî ez bextewar bûm. Di wê rojê de, min ne kêfxweşî û ne jî bextewarî hîs kir. Ez xemgîn bûm, ez ji her kesî dûr ketibûm û ji bo ku ez bi zarokan re nekevin têkiliyê, min xwe li quncikan vedişart. Min tercîh dikir ku ez li cihê mezinan rûnim, ji ber ku ew li ser cil û berg û pêlavên nediaxivîn.

Ew her tim li ser çandinî, pez û tiştên wisa diaxivîn û hetanî êvarê ji sohbetên wisa aciz nedibûn. Cejna min jî bi van çîrokên wan qediya.

Êvarê, her kesî digot ku Cejin çiqasî zû derbas bû! Lê ji bo min, ew Cejin roja herî dirêj a jiyana min bû. Min dixwest ku ew Cejin tunebûya. Heger tunebûya dê çêtir bûya ji bo min. Cejn ne ji bo kesên mîna min, ên ku nikarin pêlavên nû bikirin. Cejin ne ji bo zarokên xizan ên mîna min e, na. Ew ji bo kesên ku cilên nû û pêlavên çermînî yên geş li xwe dikin, û ji bo kesên ku çente, defter û qelemên wan ên hibrê hene ye! Cejn ji bo kesên mîna Xeyro û Şêxo ye...

Ez dilşikestî ibbiwê rojê. Lê dîsa jî, ez bi bawer bûm ku wê rojek were ez ê jî bi vê Cejnê pir bextewartir bibim. Lê heta wê demê belkî zarokatiya min li dû min bimîne...